

# *Jiyan û Raman*

Şehîdê nemir

# Dr. Ebdulrehman QASIMLO

(1930.Urmiye 13. 06. 1989 Vîyena)

*Kakşar Xorşîdî*

# *Jiyan û Raman*

Şehîdê nemir

# ***Dr. Ebdulrehman QASIMLO***

(1930.Urmiye 13. 06. 1989 Vîyena)

*Kakşar Xorşîdî*

*weşana:*
*KOÇER*
*û*
*Komeley Aştî bo Kurdistan*
*2001*

# Peyvek ji bo destpêkê

Dîroka azadîxwaziya netewa Kurd bi xwîna law û qîzên Kurdistanê hatiye avdan. Di Rojhilatê Kurdistanê de serok û rêberên Kurd tev bi du rêtiya neyaran hatine ji nav birin û di riya doza Kurdistanê de şehîd bûne. Emîrxanê Lebzêrîn li sala 1608 an li Urmiyê li dijî Sefewîyên Kurdkuj û nifşperest serîhilda û di dîroka Kurdistanê de ev serîhildan bi navê serhildana kela Dimdim hatiye binav kirin. Sefewîyan bi nexşe û pîlanên ku li dijî Kurdan darijandibûn dixwestin bi yek carî erdnigariya Kurdistanê ji Kurdan vala biken û Kurdan li herêmên din yên Iranê belav biken. Bi her awayî wan dixwest ji bi qirkirin û fermanan be an jî bi surgên û dêrxistinê be, Kurdan bi yek carî tune biken. Yek ji sebebên ku Emîrxanê Biradostî bi avedan kirina kela Dimdim desthilatdariya xwe li herêma Urmiyê da îlankirin û yekemîn pêngava ji bo avakirina kesayetiya siyasîya netewa Kurd avêt. Lê piştî ku ev hereketa biçûk lê pir bi teisîr bi dijwartirîn şêweyan hat serkêt kirin, êdî demek dirêj derbas bû heya ku şoreşa duyê di sala 1880- 1884 û bi serokatiya Şêx Ubeydullahê Nehrî li bakur û rojhilatê Kurdistanê dest pêkir. Şêxê mezin jî bi hevkariya her du Impiratoriyên Osmanî û Qacarî hat girtin û ji Kurdistanê hat dûr xistin. Sala 1907 an Ceefer Axayê Şikak bi nemêranî ji aliyê dewleta Iranê li bajarê Tebrêz hat şehîd kirin û ev bû binaxeyê yekemîn bizava nasyonalîsî di rojhilatê Kurdistanê de. Simayîl Xanê Şikak ji wê salê heya roja şehîd bûna vî (31. 06. 1931) li bajarê Şino şerekî dijwar li dijî şahên dewleta Iranê dan meşandin. Ev hereketa mezin û Kurdistanî ji bo paşeroja hereketa siyasîya netewa Kurd bû rêvekerek hêjî baştir. Di sala 1946 an de pêşewayê Kurd Qazî Mihemed bi qasî nêz salekê komara Kurdistan bi hevkariya hevalên xwe da avakirin û liyaqeta Kurdan ya ji bo dewletdariya ji hemû netewe û dewletên dinyayê re da îspat kirin. Piştî ku rêberên komarê bi bêdadiyek hovane ji aliyê şahê

gor bi gorê Iranê ve hatin şehîd kirin, rêgirên riya paqija wî Xenî Bilêryan, Ebdulrehman Qasimlo, Ismet Qazî û ...serokatiya şoreşê girtin destê xwe û berevajî xwesteka Panîranîstan netewa Kurd nemir û şoreşa xwe domand. Sala 1979 an gelên Iranê şoreş kirin û Kurdistan jî ket destê Kurdan. Dr. E. Qasimlo bi hevalên xwe re hereketek mezin di Kurdistanê de dan destpêkirin. Lê piştî çend salan vî serokê hêja jî di riya Kurdistanê de canê xwe da. Hemv serok û rêberên Kurd di rojhilatê Kurdistanê de bi xiyanet û derewan hatine xapandin û şehîd kirin. Lê xiyaneta Kurdan jî di vî karê dagirkeran de pişkdar bûye û mixabin xiyanet di dîroka azadîxwaziya netewa me de bêye mîrasek kilasîk û dîrokî.

Li vir ez dixwazim çawa şehîd kirina Dr. Qasimlo bi destê terorîstên komara islamîya Iranê bidim xuyakirin. Dr. Qasimlo kîye û çi kiriye?

## Dr. Ebdulrehman Qasimlo kîye?

Dr. Ebdulrehman Qasimlo sala 1930 an di malbatek dewlemend û navdar li bajarê Urmiyê (Rojhilatê Kurdistan) hat dinê. Wî xwîndina xwe ya destpêk û navendî li bajarê Urmiyê bi dawî anî û piştre ji bo berdewamkirina xwendina xwe çê bajarê Tehranê. Ji temenê zarokatiyê bi wan hûrbînîyên xwe yên kûr, zû pêhesiya ku gelê wî di rewşeke kambax de dijî. Herçend Ebdulrehmanê nûgihiştî ji malbatek dewlemend û bavê wî Mihemed Axa ji feodalên herî mezin di herêma Urmîyê de bû, lê wî jiyana xwe qet ji derd û xemên jiyana xelkê reş û rût cuda nedidît, ji wan jî dûr neket. Li ser wê helwestê çalakîyên xwe yên siyasî ji sala 1945 an bi pêkanîna Yekîtiya Ciwanên Demokratên Kurdistan - YCD-K ê di bajarê Urmiyê de dan dest pêkirin. Piştî ku Komara canemerga Kurdistan (Mihabad 1945-46) bi hevkariya hêzên biyanî û xiyaneta Yekitiya Sovyeta berê

têkçê, Dr. Ebdulrehman Qasimlo bi hevkariya gelek hevalên din xebata xwe ya siyasî bi rengekî nihînî û berfireh dîsa da destpêkirin û piştre bû endamê fêrmiyê Hizbî Demokratî Kurdistan. Wê demê bi hevkariya Ismet Qazî(keça pêşewa Qazî Mihemed ya mezin), Xenî Bilûryan û gelek hevalên xwe yên din bi rêkûpêkî organîzasyonek nihênî li Mihabad û derdora wê damezrandin. Di vê xebatê de dayika Kurd Mîna Qazî jî gelek hevkariya wan dikir û bi hemû îmkanên xwe yên maddî û meinewî hevkariya HDK û ciwanên Kurd dikir.

Dr. Qasimlo di temenê 18 saliyê de ji bo xwîndina bilind çû welatê Firansê. Piştî demekê ji wir çû Çikuslowakîya û piştî ku li zanistgeha Piragê lîsansa xwe ya siyasî - civakî stand di sala 1952 an de çaxê desthilatdariya Dr. Mihemed Musediq vegeriya Iranê û di xebata dijî Empiryalîzmê ya ji bo millî kirina petrola gelên Iranê(neftê) li rex hêzên opozîsyonên rijîma Şahenşahî cih girt. Li wir ji bo siyasetvanên Iranî hat xuyanî kirin ku Dr. Qasimlo di kar û xebata siyasî de mirovekî jîr û jêhatîye. Yanî wî bi pirensîb û terzê xebata xwe ya zanistî bala herkesî kişand ser xwe. Emperyalîzma Amirîka wê demê Iran kiribê navenda xebata xwe ya li dijî bizavên dij emperyalîzmê û hereketên azadîxwazî di Rojhilata Navîn de. Mihemed Riza êahê Pehlewî jî bi hevkariya wan bûbû jandarmê herêmê û mîna xûlamekê fermanên wan cî bi cî dikirin. Ev bersivek bû ji bo wan xizmetên bêgane û Emperyalîzm Emrîka ku bi jinavbirina Komara demokratîka Kurdistan û têkçêna dewleta Dr. Musediq bi hemû şêweyan hevkariya wî (M. Riza Şahê Pehlewî) kiribên û ew vegerabdibên ser desthilatdariyê. Dr. Qasimlo Piştî pênc salan xebata li dijî Empiryalîzmê careke din vegerî Çekuslovakîya û karî di sala 1962 an ji zanstgeha Piragê karî doktoraya xwe ya di para aborî de jî bistîne. Wî heya sala 1970 an wek mamosta di zanistgeha Piragê de



*Buhara 1989 Dr. Qasimlo li Kurdistanê tevî peşmergeyên HDK.*
*Teymûr Mistefayî û Şehîd Qasimlo*

êkonomiya Kapîtalîstî, êkonomiya Sosyalîstî û Teoriya pêşkeftina aborîyê karê xwe yê dersbêjiyê domand. Karekî herî girîng di jiyana Dr. Qasimlo de ew bû ku ji sala 1976 an heya 1978 an di para ziman û şaristaniya Kurdan de di zanistgeha Surbonn li Parîs mijûlî dersgotinê bê. Wî bi nivîsandina çend babetên cur bi cur di rojname û kovarên Ew-

ropî de derheqa jiyana civakî, dîrok û rewşa siyasiya Kurdan di wê demê de karî pirsgirêka gelê Kurd baştir bi raya giştiya Ewropa bide nasandin. Dr. Qasimlo li Ewropa mîna kesayetiyek siyasî û zana derheqa pirsgirêka netewîya gelê Kurdistanê dihat nasandin û dewletên Ewropî di vê derbarê de ew mîna serokaniyekê dihesibandin.

Li 11 marsê sala 1970 an dewleta Iraqê neçar ma ku bi Kurdên başûrê Kurdistanê re li ser maseya gotûbêjê rûne û dewleta navendiya Iraqê bangek ji bo otonomiya başûrê Kurdistanê da xuyakirin. Wê demê SAWAK li Iranê bîr û rayên azadîxwaziyê di singê hemû gelên Iranê de zindanî kiribên. Dr. Qasimlo ji bo ku çalakîyên HDK baştir ji berê organîze bike vegeriya Iraqê û li wir karî di demek kêm de kar û barê xwe yê rêkxistinî derbasî Rojhilatê Kurdistanê bike. Piştî ku li sala 1979 an Pehlewî ji Iranê reviya Dr. Qasimlo vegeriya Kurdistana Iranê û xebata xwe ya siyasî bi rengekî berfireh li hemû Rojhilatê Kurdistanê da destpêkirin û piştî serhildana gelên Iranê, Kurdistan jî ket destê şoreşgerên Kurd.

Berhemû herî navdar û girîngê şehîdê nemir Dr. Qasimlo pirtêka wî ya bi navê  Kurdistan û Kurd  e ku bi şêweyek zanistî lêkolînên wî di pirtêkê de hatine nivîsandin. Ev kitab yek ji çavkanîyên herî ilmî û baş e ji bo nasandina dîrok û xebata siyasîya Kurdan bi gelên cîhanê re.  Kurdistan û Kurd  heya niha bi çendîn zimanên zindî yên cîhanê hatiye wergerandin.

Dr. Qasimlo kengî, çawa û bi çi terzî şehîd bê?
Piştî ku li sala 1979 an bi têkoşîn û xebata gelên Iranê dawî bi desthilatdariya 2500 saliya şahên Iranê hat, meleyekî paşvero û dûr ji zanîna di derbarê ilmê siyasetê de Ruhillah Xumêynî di hemû waran de bû serdest û dîktatoriya paşvero bi darê zorê di

Iranê de hat damezrandin. Wê demê piraniya xaka Rojhilatê Kurdistanê bi hêz û hevkariya her du rêkxistinên Kurdan yên serekî yanî Komele û H.D.K ji bin desthilatdariya dewleta Pehlewî hatibê azadkirin. Gel piştî bi dehan salan bi rihetî bêhna bayê azadiyê kişandibê û qedirê azadiyê li ba wan bêtir ji berê hatibû xuya kirin. Kar û barê welatê Kurdan ketibê destê her du rêkxistinên navbirî.

Piştî serhildana Simkoyê Şikak(1920- 1931) û pêkhatina Komara kêm temena Kurdistanê( Mihabad 1945 - 46) ev sêyemîn car bû ku Kurdan xwe azad didîtin. Mixabin ev rewşa xweş jî zêde nedomî û rejîma paşveroya Iranê nexwast ku rastiya pirsgirêka gelê Kurd di Iranê de bipejirîne. HDK û KOMELê xwestin ku bi gotûbêjê pirsgirkê çareser biken, lê Komara Islamî bi hevkarîya cehş û hinek aliyên xwefiroş dest bi hêrişên xwe yên dijwar kir û dîsan jî Kurdistan bû qada şer û pêkdadanan. Pasdarên Xumêynî bi hemû hêza xwe nekarîn pêşmerge û hêzên gel li Rojhilatê Kurdistanê toşî şikestê biken. Xumêynî dema zanî ku bi şerê çekdarî nikarin li hemberî berxwedana gelê Kurdistanê şerê xwe yê gemar bidomînin, bi riyek din li dijî Kurdan dest bi kar bû û ji silahê olî, paşverotiya civakî û cudahiya mezhebê Kurd û Persan mifa wergirt û li dijî gelê Kurdistanê CîHAD (zibare) da îlam kirin. Kurd bi mezhebê xwe Sunîyên êafiî û olê fêrmî jî di Iranê de şîetî(şîeyên diwazde îmamî) ye.

Hêrişên weke çaxê Muxëslamlan ku li ser gelên Rojhilata Navîn hatibên destpêkirin li dijî şoreşa gelê Kurdistanê jî dest pêkirin. Berxwedana şervanên Kurd karekî dîrokî bê, lê şêweyên hovane û dûr ji pirensîbên mirovanetiyê ku ji aliyê pasdar û artêşa xwînxwara Komara Islamîya Iranê ve hatin kirin, HDK û KOMELE neçar kirin ku ji Rojhilatê Kurdistanê

derkevin. Piştî vê valabênê bi hezaran Kurd ji aliyê beşa parastina dewleta Iranê ve hatin tîrbaran kirin û daleqandin. Girtîgehên hemû Iranê bûbûn mala Kurdên şoreşger. Kurdistan mîna zindanek mezin di bin çekmeyên xwînmijên Xumêynî de bûbû meydanek tejî xwîn ji xwîna sora keç û xortên Kurdistanê.

Pêştî wê HDK û KOMELê şerê xwe yê çekdarî bi şêweyên partîzanî û bi berfirehî di hemû deverên Kurdistanê de berdewam kirin. Ev siyaseta şehîdê nemir Dr. E. Qasimlo bû ku dewleta Iran xiste nava tengavîyên mezin û pirsgirêka Kurdistanê di qada navnetewî de dengek mezin veda. şerên partîzanî ku bi piranî li her du wilayetên Urmiyê û Sinendecê diqewmîn xisarek canî û aborî ya pir mezin dida rejîma Xumêynî. Beşa itilaat (istixbarat)a Komara Islamî ji bo vemirandina vê bizava Kurdan dest avête hemû şêwe kiryarên terorîstî. Bi taybet di Kurdistanê de diravekî bêhisab xerckirin ku sîxorên xwe di nava Kurdan de zêde û zêdetir bikin. Kurdistan mîna kawilxanekê, wêran bûbû. Rewşa aborîya gel bi şêweyek berçav hatibê xwarê ku heta roja îro jî şênewarên vê siyaseta çewit li ber çavanin. Birsîtî, zindan, daleqandin, kuştin û birrîn, bêkarî û malwêranî di jiyana Kurdan de bûbû tiştekî rojane. Ji bilî wê, istixbarata Komara Islamiya Iranê bi rengekî nêhînî û veşartî di nava ciwanên Kurd de tiryak, heroyîn û vexwarinên elkolîk belav dikirin!!. Mixabin niha jî ev siyaseta wan li hemû Kurdistanê didome û heya radeyekê di siyaseta xwe de bi ser ketine. Ev karê wan ji bo tunekirina balê herî bi teisîrê şoreşê yanî hêza ciwanên Kurdistanê bû ku bîr û ramanên Kurdayetî û şoreşgeriyê ji mejiyê wan derxînin. Rojhilatê Kurdistanê di hemû Iranê de nisbet bi herêmên din yên Iranê xwedîyê yek ji paqijtirîn civatên Iranê bê. Lê mixabin niha bi vê siyaseta çewt, rewşa civata Kurdan jî pir hatiye şêwandin û şepirzeyîyek xirab ketiye nava

malbatên Kurdan.

Komara Islamî ji bilî berdewamkirina vê siyaseta xwe ya gemar li Rojhilatê Kurdistanê, çalakîyên xwe yên terorîstî derbasî dervey sinorên Iranê jî kirin û hêşta jî li ser çalakîyên xwe yên bi vî rengî dixebite. Bi dehan kardo û alîgirên HDK û KOMELê li Iraq û başûrê Kurdistanê bi destê xulamok û terorîstên istixbarata komara Islamî hatin şehîdkirin. Lê şerê partîzanî li Kurdistanê didomî û hakimiyeta dewleta navendî li Kurdistanê hê jî lawaz bê. Ji bona wê jî Refsencanî, Xaminêyî û berpirsyarê giştiyê istixbarata Iranê hatin ba hev û ketin wê fikirê ku bi navê diyalogê xwe nêzî serokê giştiyê HDK biken û mejiyê hereketa Kurdên Rojhilatê Kurdistanê tune biken. Yekemîn car li kanûna pêşî (Dêsambêr) sala 1988 an û cara duyemîn li kanûna paşî sala 1989 an Dr.E. Qasimlo û nûnerên Komara Islamî hatin ba hev. Ji destpêkê û di yekemîn dîtin de armanca berdevkên Komara Islamî kuştina serokê Kurd Dr. Qasimlo bê, lê her du carên destpêkê derfet çênebê ku vê armanca xwe ya çewt cî bi cî bikin. Armanca wan ew bû ku serokê hêza herî mezin li Rojhilatê Kurdistanê razî biken ku bikeve xizmeta wan û qet behsa xwestekên Kurdan yên dîrokî meke. Lê emê li jêr bixwînîn ku Dr. Qasimlo berevajî vê xwesteka wan bi şêweyek mentiqî û zanistî berevaniyê li xwestekên Kurdan yên meşrê û dîrokî dike.

**Vîyena 13. 07. 1989**

## Gotêbêja ku bi xwînê bi dawî bê

Kurdan di hemû dîroka jiyana bi cîranên xwe re hertim xwestine ku bi rengekî aştiyane û bi biratî bi hevre bijîn, lê mixabin ew dewletên ku Kurdistan dagîr kirine tucaran nexwestine ku bi



*13.7.1989 Dr. Qasimlo piştî gotû bêjên digel teroristen komara Islami*

awayekî mentiqî li daxwazên netewa Kurd binêrin û lêkolîneke kûr li ser vê pirsa girîng biken. Dr. Qasimlo yek ji wan kesan bû ku ji bo cî bi cî kirina vê daxwaza dîrokî pir xebitî û bi hesreta gehiştina vê xwesteka mirovane heta canê xwe jî fîda kir.
Wek hat diyar kirin cara yekê li kanûna pêşî ya sala 1988 an rêniştina bi nûnerên komara Islamiya Iranê û sekerterê giştiyê Hizbî Demokratî Kurdistan nemir Dr. Qasimlo dest pêkir. Di vê rêniştinê de terorîstên komara paşveroya Islamî nekarîn armanca xwe ya gemer pêkbînin. Cara duyemîn li kanûna paşî ya sala

1989 an dîsan peywendî hatin çêkirin, lê di vê peywendîya bi nav siyasî de jî, dîsan mirovkujên komara Islamîya Iranê nekarîn armanca xwe ya hovane cî bi cî biken.

Roja 12 û 13 û Jûlaya sala 1989 an (12 û 13. 07. 1989) bo sêyemîn car dema ku berdevkên Komara Islamî Hacî Mistefa Lacwerdî (serokê istixbarata Iranê di hemû herêmên Rojhilatê Kurdistanê de), Ceefer Sehrarûdî (cîgirê beşa istixbarata hêzên pasdarên Iranê di Rojhilatê Kurdistanê de) û zilamek din bi navê Berzekyan ji bo gotûbêjê li Vîyena hatibên dîtina Dr. Qasimlo, ji nişkave zimanê silahên wan xwînrijan peyvî û bi du guleyên ku ji demanceya yek ji nûnerên dewleta Iranê derket Dr. Qasilo hat şehîd kirin. Piştre her du hevalên wî Fazil Resûl (1) û Ebdullah Qadirî Azer nûnerê HDK li Ewropa jî hatin şehîd kirin. Di vê bêyerê de herçend Ceefer Sehrarûdî birîndar bûbû jî û tiştekî eşkera bû ku destê wî û hevkarê wî Hacî Mistefa Lacwerdî di vê cinayetê de heye, lê mixabin bi bêy ku îdareya asayiş û polîsên Avusturya di piratîkê de ji bo girtina wan karekî biken, Ceefer Sehrarûdî piştî tedawîyê (di nexweşxaneyeke paytextê Avusturyayê de) çê balyozxaneya Iranê û di roja 22. 07. 1989 an de bi bû asteng ji vî welatî derket û çê Tehranê ku ji Refsencanî û Xaminêyî re bibêje: "Me fermana we baş cî bi cî kir û hertişt li gor daxwaza me birêve çê..." Çend rojan Berzekiya jî ji aliyê polîsê Avusturyayê ve hat girtin û hukimê girtina wî jî bi fêrmî hat dayîn, lê dewleta Avusturyayê hukimê girtina wî jî hilanî û ew jî ber bi Tehranê hat bi rêxistin.
Belê bi vî rengî serok û nûnerekî din yê şoreşa Kurdistanê di welatekî Ewropa de ku her roj zêdetir ji xwarina rojane navê mirovperwerî û demokrasiyê tînin ser ziman û li ser zagênên wê diaxivin, bû fîdayê protokolên aborî. Xêzana Dr. E. Qasimlo xatûn Nesrin Qasimlo û Hizbî Demokratî Kurdistan li dijî vê

cinayetê şikayetnameya xwe teslîmî dewleta Avusturiya kirin û heya niha mehkeme bêsûd hê jî didome.

## Kasêta gotûbêjê li Ba polîsê Avusturya ye...

Bêguman Dr. Qasimlo piştî bi dawî bûna her gotêbêjekê di derbarê netîceyên gotûbêjên xwe û Iranîyan de bi komîteya navendiya partiya xwe dikete nava şiwirkirinê. Ji bona wê jî berevajî xwesteka berdevkên Komara Islamî bi şêweyek nihînî diyalog bi teyipê tomar dikir. Ev dûrbînîya Dr. Qasimlo bû sebeb ku di arşîva edaleta cîhanê de dokomentek dîrokî cîh bigire û rûyê rastînê dewleta paşverêya Iranê bi vê belgê hê jî reştir bû !!...

Piştî vê rûdavê polîsên Avusturyayê ku bêguman haya wan ji her tiştî hebê, çend kasêtên teybê di odeya gotûbêjê de peydakirin ku gotêbêja her du aliyên Kurd û Iranî heya kêliya dawiyê li ser wan hatibû tomar kirin. Piştî derbas bûna demekê polîsê Avusturyayê ew kasêt teslîmî sekerterê giştiyê H.D.K birêz Ebdullah Hesenzade kirin û bi vî rengî çawa çêbûna bûyerê ji ruyê vê kasetê bi pênûsê rojnamevan û dîrokzanê navdar Kirîs Koçêra di rojnameya Le Mond de hat weşandin û gelên cîhanê bi başî fam kirin ku Dr. Qasimlo û hevalên wî bi destê nûnerên komara Islamî û bi navê diyaloga lihev hatinê hatine şehîd kirin.

Di vê gotêbêja dawiyê de perspektîv, pêşniyar û dûrbîniyên Dr. Ebdulrehman Qasimlo li ser pirsgirêka gelê Kurdistanê û xwestekên wî wek serokê H. D. K ji dewleta navendî ya Iranê hûrbînî, mentiq û haydariya wî ya berfireh ji rewşa polîtîk, sosyal û aboriya cîhana îro dide xêyakirin. Berdevkên komara paşveroya Islamîya Iranê jî bi rengekî oportonîstî û wek nûnerên PanIranîstan bi nûnerên Kurd re diaxivin û tevlîhevî

dikeve nava zanyarî û perspektîvên wan yên vê demê ku dixwazin bi serdema hezretê Elî re bidin berhev(qiyas) kirin. Dema ew dibînin ku aliyê Kurd bi wan perspektîvên xwe yên zanistî hemû riyan li ber wan digire ,dibe ku xurura(gurur) wan ya sedsala 17 an ji ber têbînî û pêşniyarên zanistî yên Dr. Qasimlo birîndar bibin û ji rûyê neçariyê zimanê çekan bikar anîbin!! Piştî ku di sala 1988 an de Xumêynî camê jehirê vexwar û Komara Islamî biryarên UN û ji bo sekinandina şer pejirandin, şerê di navbera Iran û Iraqê de sekinî. Di wan salan de H.D.K bi şerê partîzanî hêjî li dijî Iranê şerê xwe didomand. Piştî bi dawî bûna şerê her du dewletan dirûşmek li ser der û dîwaran hat nivîsandin: Niha nubeta derxistina dijberên şoreşê ye - Eknun nêbetê bîronkerdenê zidê ênqilab est -.

Bi giştî medya Iranê jî ket xizmeta propagande kirinê li dijî bizavên azadîxwaz di Kurdistanê de ku bûbû dergoşa hemû azadîxwazên Kurd û gelên dine Iranî. Di 04. 06. 1989 an de Xumêynî mir û artêş û hêza pasdarên Komara Islamî bi hemû hêza xwe şerekî giran li dijî Kurdan dan dest pêkirin. Li gor nirxandinên nûnerên Iranê H.D.K ji ber perçebênê di Buhara 1989an de û şerê dewletê yê dijî xwe gelek lawaz bûye û neçar maye ku bi wan re pêvajoya gotêbêjan dest pêbike. Lê aliyê Iranî dibînin ku Dr. Qasimlo li ser daxwazên xwe hê ji berê jî bi îsrartire û wek Kirîs Koçêra dibeje Dr. Qasimlo tu caran wisa bi rengekî hûr bîr û rayên xwe li ser otonomiyê nedane xuyakirin. Di gotûbêjê de Dr. Qasimlo dibêje: “Divê rêberên nê yên Komara Islamî otonomiya Kurdistanê beyan (îlan) biken.” Piştî wê nûnerên Komara Islamî destkevtinên dewra yekemîna gotêbêja xwe bi Dr. Qasimlo re gehandin berpirsyarên xwe yên li Tehranê û wan jî wiha bersiv dan: “Evan tune biken û wan bikujin.”

# Gotêbêj û dawîya senaryoyê

Di destpêka gotûbêjê de Ceefer Sehrarûdî dibêje: “Selamê eleykum, me biryar daye ku danûstandinên han(wiha) bi temamî nêhênî bin, ji ber ku neyar naxwazin pirsgirêkên wiha bên çareser kirin. Heta beşek ji mirovên me di nava Komara Islamî de jî li dijî van peywendiyanin. Di nava destgeha birêveberiyê de jî em nikarîn bi eşkerahî li ser vê pirsgirêkê rawestîn an jî îşareyek ji aliyê me ve li ser bû kirin.”

Dr. Qasimlo jî bû destpêk yekrast diçe ser şirova pirsgirêka bingehîn û dibêje: “Di hevdîtina herî dawiyê de em li ser du xalan axivîn: yek pejirandina eslê otonomîyê û ya duyê jî azadbêna kar û têkoşana partiya me(di Iranê de). We bersiv da ku rêberên rejîmê otonomîyê napejirînin. Xalek din ku bi dûr û dirêjî di deftera siyasîya partiya me de axftin li ser hatiye kirin, eve: Aya silahên pêşmergeyan bên teslîm kirin an ne? Deftera siyasî di vê baweriyê de ye ku divê silah neyên teslîm kirin. Ew vê rastiyê dipejirînin ku deh sal piştî şerkirin û evqas qêrbanîyan, otonomî bêye remiza daxwazên me. Hûn dibêjin peyvek din bi kar bînin? Lê demahûn cewherê otonomîyê dipejirînin, êdî çima ji peyvan ditirsin? Nifşê min nifşê demokrasî û otonomîyê ye. ,aresernekirina pirsigirêka Kurdan dibe ku wan(2) ji navendê dûr bêxe û ber bi daxwaza cudaxwaziyê pal bide.” Piştî vê axaftina Dr. Qasimlo nûnerê Iranê Ceefer Sehrarûdî jî wiha bersiva wî dide: “Eviya cara yekê ye ku em di derbarê îdeolojiya îslamî ya li ser pirsigirêka netewan diaxivîn. Em ji bo çareserkirina pirsigirêkan guhê xwe nadeyne axiftina tu aliyan, ne Rojhilat û ne Rojava û heta em amadene di riya armancên xwe de canê xwe jî fîda bikeyin.”

Dr. Qasimlo jî dibêje: “Ez ew pirsgirêkên kuhûn li ser diaxivin û dibêjin li ser riya îlankirina otonomîyê ne(3), napejirînim.

Xaminêyî û Refsencanî niha nimêja înê li Tehranê birêve diben û ew dikarin di nimêja înê de li ser pirsigirêka otonomîya Kurdistanê biaxivin.”

Piştî vê axiftinê nemir Dr. Qasimlo otonomiyê bi vî rengî şirove û dinirxîne: Baweriya me bi çar xalên bingehîn heye: Ya yekê otonomî tê wateya necivandina desthilatdariyê di nav dewleta navendî de. Xala du-duyê û ji me re pir girîng zimanê Kurdî ye. Zimanê Kurdî divê zimanê fêrmîyê herêmên bi rênîştvanên xwe Kurd(Kurdnişîn) be. Xala sêyemîn xuyakirina sinorê herêma otonomîyê ye. Ji bo vê armancê divê diyardeyên erdnigarî, aborî û bi taybet xwesteka rênîştvanên herêmên Kurdnişîn li ber çav bû girtin. Xala çaremîn ku ji Kurdan re diyardeyek bingehîne: Pêkanîna asayiş(rihetî)ya herêmên Kurdnişîne ku divê bi destê Kurdan bixwe bû pêkanîn û îdarekirin. Em zêdetir ji vana, tiştekî naxwazîn û em ji bo pêkanîna van mercên han mirovên realîstîn. Bo nimune, ji bo diyarkirina sinoran bêguman nakokî yê çêbibin, lê ger hûn babetên bingehîn (eslî) biselmînin(bipejirînin), em li ser babetên biçûk şer nakeyin. Nabe ku peyva otonomiyê bû guherandin . VÊ PEYVÊ JI BO NETEWA KURD WATE Û ALIYÊ XWE YÊ ATFî Û DîROKî HEYE . EVYA MîNAK E. EZ DI WÊ BAWERIYÊ DE ME KU HÛN NAVEROKA WÊ DIPEJIRîNIN, LÊ NAXWAZIN VÊ PEYVÊ BIKAR BÎNIN. GER KESEK TEKSTÊN AYîNî BIXWîNE, NIKARE BI BÛ BISMîLLAH ELREHMANÊ ELREHîM DEST PÊBIKE. DI VÊ DERBARê DE Jî HEMA WIHAYE. HÛN NAVEROKA OTONOMIYÊ DISELMîNIN, LÊ BISMILLAHA Wê NAPEJIRîNIN.

Li vir nûnerên Komara Islamî dibêjin: Beriya ku em gotûbêja xwe bidomînin(ku hêvîyek mezin afirandibû), divê peywendiyê bi Tehranê re deynîn.

Rojek piştre 13 û Juîyê, Ceefer Sehrarûdî dîsa bi hevkarên xwe ve tê cem Dr. Qasimlo û dibeje: Me bi - Biraderan - re peywendî girtiye û wiha axftinên xwe didomîne: We duh got bila karbidestên Komara Islamî di nimêja înê de li ser pirsa otonomîyê biaxivin û îşarê pê biken.... Babetên wisa hene ku berpirs û birêveberên(nimêja) înê dikarin li ser biaxivin, lê tiştên wisa jî hene ku li ser wan di navbera me de dubendî(nakokî) hene.

Piştre Ceefer Sehrarûdî xwe ji naveroka vî behsî dûr dixe û viya ron dike ku rejîma Komara Islamî çawa û bi çi şêweyekê karên xwe cîbicî dike an jî wan davêje pişt guhê xwe û dibêje: Xuyaye ku pirsgirêkên din jî hene. Di van deh salên derbas bêyî de qala rola bazarê tê kirin... Hejmarek di vê baweriyê de ne ku nabe aboriya Iranê bêxe dest û feqîr(hejar) mîna rêniştvanên hejmara duyan bên dîtin. çaxê Îmam Xumêynî saxbê da xuyakirin ku îslam ne alîgirê kapîtalîsmê ye û ne jî alîgirê aboriya dewletî ye, belkî diyardeyek pêwîste ku divê di nava van her duyan de be. Riya sêyem jî heye ku zagona wê bixwe jî heye: Yasa sê caran bo parlimanê hat pêşkêş kirin, lê netîce... Heya di dawiyê de neçar man ji Civata diyarkirina berjewendîyan(meslehetê) re bişînin. Niha em vegerîn ser behsa otonomîyê... Di vê derbarê de jî mîna pirsa aborî dû nêrîn hene: Yek ji wan dibêje di çaxê Hezretê Elî de, hezret(Elî) di navenda desthilatdariya îslamî de hikumet dikir û herêmên din jî yên bi navê Wilayet hebên ku bi destê Walîyan dihatin birêvebirin û desthilatdariyek pan û berfirehtir ji vê otonomîya îro di destê wan de hebû. Aliyê din dibêjin nexêr, ev diyarde vedigere çaxê Hezretê Elî û îro dinya bi şêweyek din e (Yanî dinya hatiye guherandin). Neyaran derdora me pêçandine. Endamên peymana Nato û rejîmên kevneperest nahêlin otonomî di çarçove û sino-

rê xwe de bimîne. Yê bixebitin ku bi berfirehkirinê (yanî berfireh kirina sinorên otonomîyê), ew ji navendê cuda bikeneve. Otonomî ne tiştekî wihaye ku bi yek an du caran îşarepêkirinê di nimêja înê de bû çareserkirin. Pirsa du-duyan jî eve ku HDK dixwaze di vê rewşa îro de xwe biparêze û bi Komara Islamî re jî gotêbêjan pêkbîne, lê ez di vê hindê de bêgumanim ku ev pêşniyar qet nayê pejirandin.

Piştre Ceefer Sehrarûdî di berdewam kirina axftinên xwe de careke din xwe di derbarê çawaniya terzê birêvebirina karûbarê rejîma Komara Islamî de dixafilîne û ji Dr. Qasimlo û hevalên wî re wiha dibêje: nimuneyek din ji were tînim: Ew biryarên ku hûn niha di meydana siyaseta derve de dibînin, piştî çendha (çendîn) sal gotêbêjan hatine wergirtin. Biryara ji bo birrandin (qetandin)a peywendîyan bi Emrîka re û damezrandina peywendîyan bi Yekitîya Sovyet re bi şevek û ji aliyê yek-du kesan ve nehatiye wergirtin. Pir behs li ser hatiye kirin ku piştî sê sal, deh sal, yazde sal û bi berçavgirtina rewşa Sovyetistanê gehiştine vê netîceyê ku li ser hinek tiştan bi wan re li hev bên. Çima? Ji ber ku me pirsgirêka Efxanistan, Pakistan û Kendavê heye û xuyaye ji ber ku bi Rojava re jî pirsgirên me hene. Ji bona wê jî divê li ser otonomîyê jî bi salan behs bû kirin. Ez di wê baweriyê de me ku merc û rewşa niha wê otonomîyê ku tu li ser diaxivî, napejirîne....

Piştî van gotinên Ceefer Sehrarûdî, Hacî Mistefa tê nava behsê û dibêje: Bismillahî Elrehmanê Elrehîm, partîyên Komunîst li ser (pirsgirêka) netewan pişta xwe bi dîtinên Stalîn ve girêdan e. Ereb dibêjin, bi dîtina me partîyên Sosyal - Demokrat bîr û rayên xwe hene, di derbara me de hêzên îslamî û Komara Islamî ya Iranê heya niha pirsgirêka netewan helnesengandiye (nenirxandiye). Ger bibe û Komara Islamî di vê derbarê de

bîrêrayên xwe cuda bîne ziman, serkeftinek pir baş bi dest dikeve. Di îslamê de xuyaye ku rêya pêxember û cîgirên wî heye. Hîvîdarim ku Komara Islamî van diyardeyan bêxe ber çav û di nav de ya ku sunnet(riya pêxember) dide destnîşan kirin û ew tiştê kuhûn dixwazin bi sinorek navincî bû bi dest xistin... Di bersivê de Dr. Qasimlo dibêje:hûn dibêjin pirsgirêka eslîya niha ne çareserkirina otonomîyê ye, lê(belkî) xuyakirina şêweya peywendiya di navbera Hizba Demokrat û Komara Islamî de ye. Em hatine û ji we daxwaza çareserkirina pirsgirêka otonomîyê dikîn, mafê çarenivîs(qeder)ê dikare bi şêweya serxwebên, federalîsim û otonomîyê bû cî bi cî kirin. Pirsgirêka me eve ku em bizanîbin aya birastî Komara Islamî dixwaze pirsgirêka netewan di Iranê de çareser bike an ne? Eger dixwaze, bi çi şêweyî? bi şêweya serbixwebên, federalîsim an jî otonomî? Me Kurdan daxwaza herî kêm ji we kiriye, lê em federalyetê jî dipejirînîn. Xuyaye bi dîtina min ji ber ku îslamê di wî çaxî de şêwe federalîsmek pejirandibê, baştire ku şêweya fedralî li ber çav bigrîn û wek mînak Yekîtiya Komarên Fedralî yên Iranê pêkbînîn. Niha gerhûn ji van qet yekê jî napejirînin, êdî eşkeraye ku naxwazin pirsgirêka neteweyan çareser biken... Dibe ku sibe beşeke din ya Iranê otonomîyê bixwaze,hûn divê zîrek (netirs) bin û pirsgirêka nava Iranê bi duristî û gor zagon (qanên)ê û mîna hev ji bo tevan, ji bo Ereban, Belûçan, Tirkmenan û Kurdan çareser biken. Ger îrohûn nekarin vê pirsgirêkê çareser biken, yê di pêşerojê de(pirsgirêk) mezin bibe.

Piştî behsekî kurt, biryar tê standin ku gotûbêjker roja din dîsan bên cem hev. Lê beriya rabênê û ji hev veqetînê Fazil Resûl dibêje: Anhûn yê lihev bên an jî dixwazin bi bû şer hevdîtinên xwe bidomînin an jî hema bi şerhûn yê gotêbêja xwe bidomînin, lê ya herî baş ewe ku hema niha li ser tiştekî pêkbên, derfetek başe. Dibe ku sê salên din rewş bû guherandin û parsengîya (giranî) hêzan bi awayekî din be (bê guherandin)... Sed

mixabin hê axftina Fazil Resûl bi dawî nebêye ku dengê guleyên silahên terorîstên Iranî tê bihîstin. Eviya dengê herî dawî yê ji bo bersiva aştîxwazane ya nûnerên Kurd bû ku mentiqa dagîrkerên Kurdistanê dide xuyandin. Dengê teqandina guleyên silahên nûnerên Komara Islamîya Iranê jî li ser teyîpê hatiye tomar kirin û piştre bêdengîyek tam....,axê ku cîran ji ber birîndar bêyîna Ceefer Sehrarûdî polîs agehdar dikin, ew laşê sê Kurdan dibînin ku di nava xwîna xwe de gevizîne û can dane...(4)

Belê, hûrbînî û zimanê rewanê Dr. Qasimloy di şirovekirina pirsgirêka hemû kêmnetewên ku di Iranê de dijîn, nûnerên dewleta paşverêya Iranê neçar dike ku bi zimanê silahê bersiva xwestekên nûnerê Kurdan bidin. Lê gelo aya cîhana îro ji van her du rêyan kîjanê dipejirîne: Aştî an şer? Yê di pêşerojê de doza kê ji aliyê hemû azadîxwazên cîhanê ve bû pejirandin: Doza aştîxwazîyê an jî xwînrijandinê?....

Dr. Qasimlo li ser rewşa Kurdistan û cîhanê mirovekî agehdar bê, lê birastî Ceefer Sehrarûdî û hevkarên wî ji hemû aliyan ve ne di wê mistewayê de bên ku mirovekî mîna Dr. Qasimlo û nûnerekî doza Kurdan bi wan re bikeve nava têkelî û hevdîtinan.

Dr. Qasimlo jî weke hemû rêberên din yên mîna Simkoyê Şikak, Pêşewa Qazî Mihemed, Seyîd Riza Dêrsimî û hwd...di riya aştî yê de canê xwe yê pak bexşî.
Ji dest çêyîna wî ji bo doz û pirsgirêka gelê Kurdistanê xisarek mezin bê, lê neyarên doza Kurdayetiyê divê baş bizanîbin ku bîr û ramanên rêberên Kurdan di mejî û xwîna netewa wan di cîh girtine.

Rêya şehîd û serokên Kurdistanî hertim yê bû domandin.

# Perawêz

1. Fazil Resûl ji başûrê Kurdistanê û hevalê Celal Talbanî sekerterê giştiyê YNK bû ku rolê navbeyinkariyê dilîst.
2. Li vir mexseda Dr. Qasimlo ji (wan) ew nifşê wî ye ku demokrasî û otonomîyê dixwazin.

3. Yanî li ser rêya ragehandina otonomîyê kelemin.

4. Polîsê dewleta Avustorya qet nexwast ku bi berfirehî li ser çawa kuştina nûnerên Kurd bisekinin. Ev bû sebeb ku terorîstên Komara Islamî hartir bibin û piştre li Almaniya Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî jî bi fermana serokên olîyên Iranê hatin şehîd kirin. Lê dewleta Elmaniya berevajî dewleta Avustoriya bi pêkanîna dadgeha Mîkonos rêyê karbidest û rêberên Iranê di hemû cîhanê de reş kir û ji herkesî re îspat bû ku rêberên Iranî rasterast di kiryarên terorîstî de li dervey Iranê jî beşdariyê dikin. Di havîna sala 2000 de endamekî beşa parastina Komara Islamî bi navê Ehmed Bêhbehanî ji Iranê revîyaye û xwe teslîmî dewleta Tirkiyê kiriye. Ehmed Bêhbehanî îdia dike ku wî bi destê xwe Dr. Qasimlo kuştiye û ji aliyê istixbarata Komara Islamiya Iranê ve ji bo vî karê terorîstî hatiye wezîfedar kirin. ( Binêrin: Rojnama Nîmrooz hejmara 589). Gelo birastî esrarên şehîd ketina serokên Kurd hê jî bi rastî û duristî nehatine eşkere kirin?

Têbînî: Beşa dawiya vê nivîsê ku li ser çawa şehîd kirina nemir Dr. Qasimlo hatiye nivîsandin Kirîs Kuçêra bi zimanê Firansî di rojnameya Le Mund de belav kiriye. Min û hevalê xwe Dr. Mistefa. K wergerande ser zarava Kurmancî û ezê vê nivîsê bi zarava soranî jî di kovar an rojnameyek Kurdî de biweşînim.